# DESTÛRA BETLANEYA BI-MEAŞ YA MINNESOTA

**Ew ê ji** 1-ê Çileya 2026-an **pê ve bi bandor dibe**

**Destûra betlaneya Bi-Meaş ya Minnesota yê dema ku hûn hewceyê destûra betlaneyê ji bo lênêrîna xwe an malbata xwe bin, diravdayin û piştgiriyên kar radest dike.**

## Ez dikarim destûra betlaneya bi-meaş ji bo çi bikar bînim?

### Destûra Betlaneya Bijîşkî (Medical Leave):

- Ji bo lênêrîna rewşa tenduristiya xwe ya cidî, di nav de lênêrîna têkildarî ducaniyê, zayînê, û başbûnê

### Destûra betlaneya Malbatî (Family Leave):

- Destûra betlaneya Girêdanê (Bonding Leave) – Ji bo lênêrîn û girêdanê bi zarokekî nû ku bi rêya zayînê, pejirandinê, an sergêriyê hatîye qebûl kirin
- Destûra betlaneya Lênêrînê (Caring Leave) – Ji bo lênêrîna endamekî malbatê bi rewşeke tenduristiyê ya cidî
- Destûra betlaneya Malbatê ya Leşkerî (Military Family Leave) – Ji bo piştgirîkirina endamekî malbatê ku gazî xizmeta çalak kirîye
- Destûra betlaneya Ewlehiyê (Safety Leave) – Ji bo bersivdana li ser mijarên tundûtûjiya navxweyî, êrîşa zayendî, an tacîzê ji bo xwe an endamekî malbatê

Bi giştî, divê rewş ji heft rojan zêdetir bidome û ji aliyê dabînkerê lênêrîna tenduristiyê an pisporek din ve were piştrast kirin.

## Ez ji bo Destûra Betlaneya Bi-Meaş mafdar im?

Piraniya karkerên Minnesota yê ji aliyê Destûra Betlaneya Bi-Meaş ve mafdar in. Hûn mafdar in, bêyî mezinahiya kardêr an saet û rojên ku hûn dixebitin. Peymankarên serbixwe û kesên xweserî bixweber nayên parastin, lê dikarin daxwaz bikin. Eger di sala borî de herî kêm mîqdarek ji bo kar li Mînnesota yê ji we re hatibe dayîn ($3,900 ji bo destpêkirina Destûra betlaneya Bi-Meaş di 2026-an de), dibe ku hûn mafdar bin ku diravî bistînin.

## Ez dikarim çiqas destûra betlaneyê bistînim?

Dibe ku hûn mafdar bin ku ji bo her salek feydeyê heta 12 hefteyan destûra betlaneya malbatî an bijîşkî bistînin.  Eger hûn di salek sûdwergirtinê de hem hewceyê destûra betlaneya malbatî û hem jî ya bijîşkî bin, dibe ku hûn bi tevahî heta 20 hefteyan mafê Destûra Betlaneyê hebin.

## Ez ê çiqas meaş bistînim?

Dema ku hûn betlaneya bi mûçe digirin, hikûmet ji we re pereyê wê dide. Destûra bi meaş heta %90 ê mûçeyên we dide, li gorî asta dahata we, bi sînorek heftane ku wekhevî mûçeya heftane ya navînî ya ku ji hêla dewletê ve hatî destnîşankirin e. Ev mîqdar her sal diguhere û ji bo destpêka betlaneya bi mûçe ya 2026 an heftane 1,423 dolar tê destnîşankirin

## Kî Heqê Destûra betlaneya Bi-Meaş Dide?

Destûra betlaneya Bi-Meaş ji aliyê heqê sîgortayên ku ji aliyê karmend û kardêran ve têne dayîn tê dabînkirin. Rêjeya destpêkê ya heqê sîgortayê 0.88% ê meaşê dapûşînê ye. Kardêrê we dikare heya 0.44% ji meaşên we derxe da ku beşdariya we ya heqê sîgortayê veşêre.

## Piştgiriyê min ê kar çi ne?

- Parastinên Kar: Bi gelemperî, divê hûn vegerin ser karê xwe an pozîsyonek wekhev dema ku hûn ji destûra betlaneyê vegerin. Piştgiriyên kar 90 roj piştî roja kar kirina we têne cîbicî kirin.
- Berdewamiya Sîgortaya Tenduristiyê: Bi giştî, divê kardêr berdewam bikin ku beşdariya xwe ya heqê sîgortaya tenduristiyê komî di dema destûra betlaneya we de radest bikin.
- Ne-tolhildan an Destwerdan: Kardêr divê destwerdan nekin an li dijî we tolhildan nekin dema ku hûn daxwaz dikin an Destûra betlaneya Bi-Meaş bikar tînin. Kardêr nikarin diravdayinên we yên Destûra betlaneya Bi-Meaş, ji we kêm bikin.

Ji bo pirsên li ser Destûra betlaneya Bi-Meaş, ji kerema xwe bi Destûra betlaneya Bi-Meaş ya Minnesota yê re li 651-556-7777 telefon bikin an serdana malpera me bikin.

Eger hûn difikirin ku kardêrê we qaîdeyên piştgiriya kar binpê dike, bi Beşa Standardên Kar (Labor Standards Division) li Wezareta Kar û Pîşesaziya Minnesota yê (Minnesota Department of Labor and Industry) re têkilî daynin.

**BÊTIR HÎN BIBIN:** paidleave.mn.gov

Ev agahî dikare bi şêweyên alternatîf ji bo kesên seqet an jî kesên ku hewceyê alîkariya ziman in were radest kirin. Ji bo vê yekê, ji kerema xwe bi Navenda Têkiliyê ya Destûra Betlaneya Bi- Meaş re li ser 651-556-7777 an 844-556-0444 (bêpere) telefon bikin.

MINNESOTA PAID LEAVE

Minnesota Paid Leave | 180 E 5th St Suite 1200 | Saint Paul, MN 55101

12/2025